

**Ji bo dêûbavên, zarokên
wan diçin hêlînên Berlinê**

11.05.2021

Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser vekirina lênêrîna zarokan a di xebata asayî ya dorbisînorkirî de ya piştî 17ê Gulana 2021an

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

rêjeya-7-rojan a bûyerên enfeksiyonê yê li Berlinê niha (li gorî 11.05.2021an) bûye 93,7 û bi vê yekê re jî ji rêjeya hefteya borî gelek kêmtir bûye. Her wisa li komên zarokên hêlînan jî hejmar di demên niha de paş ve diçin.

Ji ber vê pêşketina erênî û zanîna li ser zehmetiyên we, ku piştî girtina hêlînên zarokan a ji 08.04.2021an ve pêk hatine, Senatoyê di civîna xwe ya îro de biryar stand, ku navendên lênêrîna zarokan a danê rojê û hayjêmana zarokan a danê rojê dîsa vebin.

Piştî 17.05.2021an xizmetên piştgiriya zarokan a danê rojê dê dîsa ji bo tevahiya malbat û zarokên wan vekirî bin û xebateke asayî ya dorbisînorkirî ya li gorî şertên pandemiye dê were pêşkêşkirin.



Bi hûratî ev yek hatine plankirin:

- (1) Divê tevahiya zarokên xwedî hevpeymanan lînêrînê bikaribin herin hêlîna zarokan. Dorbisînorkirina her komeke armanckirî radibe. Êdî pêwîstî bi bikaranîna Lîsteya-KRITIS ya pîşeyên girêdayî sîstemê tune ye.
- (2) Divê hêlînên zarokan xizmeta lînêrînê di çarçoweyê li gorî pêwîstiyê pêşkêşî malbatan bikin, ku ne li gorî pêdiviyê ye, lê li gorî mafê wan ê hiqûqî ye, ku herî kêr bi qasî 7 saetan e. Li gorî vê yekê divê herî kêr xizmeteke wisa were pêşkêşkirin, ku komeke bi demdirêjiya lînêrînê ya rojane ya li gorî kuona lînêrînê ya ji bo tevahiya rojê hebe.
- (3) Di xebata asayî ya dorbisînorkirî ya li gorî şertên pandemiyê de hêj jî armanc ew e, ku pêwendî hêrî kêr bimînin û şopa enfeksiyonan diyar be. Divê lînêrîna zarokan bi qasî ku pêkan e di komên sabît de pêk were. Ji ber sedemên rêxistinî dibe ku kom li gorî rewşê carekê ji nû ve li hev werin civandin, lê belê divê dîsa bi rêbazên sabît bixebitin.
- (4) Gava ji ber kêmbûna xebatkaran an jî sedemên rêxistinî pêwîstî pê hebe, hingê bi riya hevaxaftina di navbera dêûbav û hêlîn û her wisa Çavdêriya Hêlînên Zarokan de dorbisînorkirina xebata lînêrîna zarokan pêkan e.
- (5) Divê mirov wekî berê niha jî li gorî tedbîrên heyî yê paqijiyê tevbigere.

Em hêj jî ji we rica dikin, ku hûn li gorî pêdiviya şexsî ya lînêrînê ya di çarçoweya pêwîst de sûdê ji xizmetê bigirin û di derbarê vê mijarê de bi rêkûpêk li gel hêlîna xwe biaxivin.

Vekirina van hêlînan bi riya domandina tedbîrên heyî yê ji bo piştgiriya parastina tenduristiya xebatkar û zarokan a berdewamî pêk tê. Di nav van tedbîran de bi taybet berdewamkirina stratejiya test û derzîkirinê cî digire.

Wekî berê, em ê piştî pêkanîna xebata asayî ya dorbisînorkirî ya li gorî şertên pandemiyê, bûyerên enfeksiyonê yê li van saziyan bi baldariyeke mezin bişopînin û binirxînin, da ku li gorî pêdiviyê tevbigerin.

Wekî din em dixwazin di derbarê van xalan de agahî bidin we:

Mesrefên xwarin û vexwarinê:

Li gorî nêrîna SenBJFê bi riya meşandina xebata asayî ya piştî 17ê Gulana 2021an pêwîst e, bi gelemperî tevahiya dêûbavan dîsa wekî berê parçeyek ji mesrefên xwarin û vexwarina zarokan bidin, ku mehê bi qasî 23 Euro ye. Her çiqas zarokên we hêj jî neçin hêlîna zarokan, dîsa ev yek her wisa ji bo we jî derbas dibe. Lê belê me ji saziyên hêlînên zarokan xwestiyê, gava zarokên we di meha Gulanê de ji 10 rojan bêhtir ji xizmeta lînêrînê sûdê negirtibin, hingê heq ji we nestînin.

Qeydiyên nû / Hînbûn:

Bi gelemperî qeydiyên nû û hînbûna li hêlînên zarokan dîsa ji bo tevahiya zarokan pêkan in.

Peywira testê ji bo zarokên baş bûne:

Di demên dawî de pirsên di derbarê îstîsnaya peywira testê ya li hêlînên zarokan ya ji bo zarokên baş bûne li me hatin kirin. Ji bo vê yekê qanûna § 6c ya Rêzicknameya Duyemîn a Tedbîrên Parastina ji Enfeksiyonê derbas dibe, ku bi taybet **îstîsnayeke ji peywira testê** tê xwestin ji bo

„kesên başbûyî, ku dikarin encameke pozîtîv a testa PCRê ya piştî enfeksiyona vîrusa koronayê ya SARS-CoV-2 nîşan bidin, ku **herî kêm 28 roj û herî zêde şeş meh** kevin e“.

Ev yek ji bo wan zarokên başbûyî yê li hêlînên zarokan derbas dibe, ku ji wan çêkirina testekê tê xwestin.

Dêûbavên hêja,

ji bo piştgiriya we ya jiholêrakirina rewşa niha em spasiya we dikin. Em hêvî dikin, ku bi riya vekirina hêlînanên zarokan a di demeke nêzîk de rêxistinkirina jiyana we ya rojane hêsantir bibe û hinek normalî bikaribe bikeve nav jiyana we ya malbatî.

Ji bo pirsên we, xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan hêj jî bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji saet 9an heta 13an xwe bigihîninê.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya V

A Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk